

# Ziman û Zar

salî duwem\_ jmare (6) (befranbar\_2722) (zstanî\_2022)

Govarekî zimannasî ya werzî ye

Xudan îmtiyaz:

Dr. Teha Resûl

Sernivîser:

Fereydûn Saman

Sernivîserê fexrî:

tofîq wehbî beg

### **Desteya şîretgerî:**

d.wiryâ omer emîn

d,hogir mehmûd

d.mizgim çali

kameran rehimî

îdris lawe

### **Rawêjkara kargêrî:**

Evîn ehmed

### **peywenî:**

Sara seadî

Xezan baban

**ji bo peywendî bi kovara ziman u zarî:**

**fereydunsaman61@gmail.com**

00964 750 448 0493

# Ziman û Zar

salî duwem\_ jmare (6) (befranbar\_2722) (zstanî\_2022)

Govarekî zimannasî ya werzî ye

Serrastker: kûkman m.şilanî

dîzaynî nawewe: umêd mihemed

berg: aram elî

çap: 2022

tîraj: 500 dane

nirx: 5000 dînar

çap: çapxaney taran



damezrawey kerîmî eleke ê  
navenda Xanî ji bo lêkolînên hizrî derdixe



---

# AXAFTINA BI ZIMANÊ BIYANÎ

---

■ Bahadîn Robar

Li gorî lêkolînên zaniştî û encamên xebatên arkeolojîk pêşiyên kurdan ji berî zayîna Îsa 10 hezar salan li Mezopotamyayê ji jiyana koçberî derbasî jiyana dêmanî bûne. Ango derbasî serdema gund û çandiniyê bûne. Qewmên ku cara yekem gund ava kirine û çandinî kirine debara xwe bêguman protokurd (dapîr û bapîrên kurdan) in. Mezopotamya herêmeke ji hemû aliyan ve gelek dewlemend e. Bi dar û dariştanan, bi çem û robaran, bi deşt û zozanan û bi çiya û geliyan weke bihuştê ye. Heta di wê serdemê de Mezopotamyaya Jor weke dîlmûn tê binavkirin, yanî bihuşt. Çar demsalên salê têde tê jiyîn. Ji bo çandiniya zad û darfêkiyan erdnîgariyek bêhempa ye. Piştî sedhezaran salan mirovatî ango Homo Sapiensên ku pêşiyên mirovên hemdem in koçberî dikirin û çend caran li dora cîhanê zivîrîn, biryar dan ku tu ax û warê ji Mezopotamyayê xweştir û dewlemendtir nîn e, lewre li ser vê erdnîgariyê bicih bûn û bûn sedema serdemek nû. Herwiha her tişt wan bi xwe afirandin û peyda kirin. Ji berî wan tu azmûn û cerebeyên tu zindîweran tunebûn. Her dahênanek (îcad) û afirandineke wan gelek û gelek girîng bû. Ji ber ku ev dahênan û afirînerî di encama keda sedsalan de pêk dihat. Nivîs tunebû, lewre veguheştin û paraştina van tiştan jî gelekê zor û zehmet bû. Bes di pêşengiya jinê de her tişt ku dihat afirandin û dahênanandin di asta pîroziyê de bû. Jibîrkirin, bînirxdîtin, windakirin û dilsarî û xemsariya li hember vê kedê weke bêsincî û bêrêziya li hemberî civakê dihat qebûlkirin. Herwiha ji bo kesên wisa nêzîk bibûna cihê şerm û riswayê bû. Serdem serdema pêşketin û hilberînê bû. Hem hiş û aqil û raman bipêş diket, hem tevna civakî bipêş diket, hem alav û amûrên pêwîştiya civakê bipêş diketin û hem jî bi van xalan re ya herî girîng ziman bipêş diket. Her karek, her amûrek, her dahênanek, her riwek û zad û ajalên hatine vedîtin, xwedîkirin û kedîkirin û bikaranîn pêdivî bi navekî hebû û wê civakê jî li gorî taybetî û kêrhatina wan tiştan û vedîtinan nav li wan kirine. Bi vê yekê jî zimanî rehê xwe berdaye nava ax, xweza û civakê. Ji ber ku kurd ji gelên herî pêşî derbasî jiyana gund û çandiniyê bûne, ev keda zor û zehmet wan kiriye.

Serdemên piştê ji aliyê gel û civakên cîran ve navê çand û zimanê kurdî û heval û hevkar û hevparên wî weke «çand û zimanên Arî» tê binavkirin. Wateya peyva «Arî» jî bi du awayan tê şîrovekirin. Ya yekem, bi kurtasî mirov dikare bêje; bijarte, pêşketî, sereke û qedirbilind. Ji ber ku gel û neteweyên cîran her tiştên xwe ji wan hîn dibûn. Zana û pêşengên civaka wê serdemê bûn. Ya duyem jî wiha ye; Kesên çandiniyê dikin, xwediyê ga û amûrên çandiniyê. Ew jî pîrozî û girîngiya ji bo kedê dide nîşandan lewre ew Arî (arîen, aryen) ne. Ev têgeh bi demê re bû navê beşeke mezin a ku ji heman çand û zimanî çavkaniya xwe wergirtî. Bingeha zimanên Hînd-Ewropî li ser vê çand û zimanî bipêş ket. Ligel ku hezaran sal bi ser re derbas bû hê jî gelek peyv û têgehên ku xwendin, nivîsandin û wateya wan heman awayî ne di zimanên vê malbata zimanan de hene. Weke mînak; bi kurdî «stêr» bi îngilîzî «star» bi frensî «star» bi elmanî «stern» bi farisî «star» bi îtalyanî «stella» bi yewnanî «asterî» bi romenî «stea» û hwd. di piraniya zimanên Hînd-Ewropî de bi vî awayî nêzîkî hev in. Koka wê çand û zimanî di vê xaka qedîm û pîroz de reh berdane û li cîhanê belav bûye. Ev reh bûye reha jiyanê û bûye reha exlaq û wijdanê. Weke honandin û raçandina berr û konan, zimanê kurdî kêlî bi kêlî, ta bi ta, nefes bi nefes û gav bi gav hatiye lêkirin û honandin. Ew keda dayîkên kurd e, keda mîrên kedkar û dildar e. Lewre di nava gelê kurd de ziman rûmet e, şeref e û namûs e. Gelê kurd êrîş û hewldanên tunekirin û bişaftinê ên li ser zimanê xwe weke bêrûmetî û bênamûsiyê dibîne û wisa jî nêzîk dibe. Ji ber vê helwestê û taybetmendiya jî bihezaran sal in bêyî ku pergaleke siyasî ya parastinê hebe zimanê kurdî kariye xwe bi hêza xwe ya cewherî biparêze û li ser piyan bigire. Di nava malbatê de, di êl û eşîran de, li kolan û civatan de axaftina bi zimanê biyanî di nav kurdan de weke şerm û bêrêziyê tê/dihat dîtin. Her çî qas erdnîgariya Kurdistanê ji aliyê çar dewletan ve hatibe parvekirin û polîtîkayên tunekirin û asîmîlasyonê li ser hatibe ferzkirin û meşandin jî kurd ji çand û zimanê xwe dûr neketin û berxwedana pîroz domandin heta roja îro. Bi taybetî dayîkên kurd zimanê

xwe di dilê xwe de, di stran û lorînên xwe de paraştin. Heke carinan hin kes bi zimanê biyanî biaxivîyan û ew hatibe dîtin û bihîştin weke ku sûc û gunehên gelek mezin kiribe hatine şermezarkirin û riswakirin. Heta min bi xwe gelek caran bihîştîye di nava gel de digotin; kurê filankes li filan derê bi yekî re zimanê tirkî diaxivî, ji rê derketiye bavo.! Berriya ji qalikê xwe der e.! An jî digotin; keçê rebenê, kezîkurê keça filankes di kolanê de bi zimanê tirkûmanî diaxivî, weyla li min û vê ecêbê. Di nava malan û civatan de dibûn dengûhehs û kesayeta wan dihat nîqaşkirin. Weke îxanetkar û jixweder li wan dihat nêrîn. Lewre kurd qewmekî gelek girêdayê çand û zimanê xwe ne. Fikir û ramanên cuda jî hebin û li dijî tevgerên fikir û ramanên hevûdin jî bin dîsa bi zimanê dayikê diaxivin û xwe bi zimanê xwe pesin didin. Li vir dixwazim serpêhatiyekê ji wê re pêşkêş bikim. Camêrek li gundekî Gevera Colemêrgê mamostetî dikir. Serpêhatiya xwe wiha ji min re vegot ; «Ez mamosteyê gund bûm piraniya gundiyan cerdevan bûn. Kurdiya min gelek qels bû û tenê min hin peyv fêm dikir, lê hema bêje min qet nedikarî ez bi kurdî biaxivim. Hinekê devoka Amed û Colemêrgê jî ji hev cuda bû lewre min qet ji kurdiya wan fêm nedikir. Rojekê ez di kolaneke gund re diçûm min dît jinekê tenûr dadaye û nanî dipêje. Dema ez nêzîk bûm min ew nas kir û min bi zimanê tirkî gotê; qewet bê ji te re. Wê jî bi tirkî bersiva min da û got rehmet li dê û bavê te. Û min gotê; ka ew bênamûsê hevjinê te li ku ye? Dema min welê gotê pir bihêrs bû û got; çima tu jî mêrê min re dibêjî bênamûs? Min jî gotê hevjinê te cerdevan e, ma ne bênamûs e? Dîsa jinikê bihêrs got; Hema çawa be ne weke te ye, qet nebe ew bi zimanê xwe kurdî dizane û diaxive, lê tu bi zimanê xwe yê zikmakî nizanî û bi zimanê tirkî diaxivî lewre tu mafê te nîn e ku tu gotinên sar û dijûnan bidî hevjinê min. Ew ji min re bû ders û azmûnek xurt ku ez hînî zimanê xwe yê zikmakî bibim.» Piştî hingê ev mamoste bi taybetî peywira xwe ji bo Cizîrê dixwaze û peywira wî dikeve Cizîrê. Doştek li min geriya û got peywira hevlekî min ê mamoste ketiye Cizîrê da tu jê re bibî alîkar wê baş be. Welhasil



em jê re bûn alîkar û li Cizîrê bicih bû û qeydiya xwe ji bo qursa zimanê kurdî li komeleya Lêkolîn û Pêşvebirina Zimanê Kurdî (KURDÎ-DER) çêkir. Wê demê ez serokê wê komeleyê bûm û di heman demê de min mamosteya zimanê kurdî jî dikir. Ew camêr di hundirê salekê de bû weke bilbilekî, ew qasî kurdiyek nazik û paqij hîn bû û diaxivî. Û piştî jî ji bo çanda kurdî kete nava xebatan û gelek xebatên çandî yên giranbuha jî kir. Tenê di vê sedsala komarê de bi polîtîkayên asîmîlasyonê yên dijwar û amûrên dîtbarî, guhdarî û nivîskî yên weke rojname, kovar, tv, radyo, torên medya civakî û hwd. pergale kariye heta astekê bandorek neyînî li ser zimanê kurdî bike. Tenê bi polîtîkayên asîmîlasyonê jî sînordar nemane, herwiha bi zagon û hiqûqê xwe jî guvaşek mezin li ser zimanê kurdî dane meşandin û hê jî didin meşandin. Li gel ku ev qas dijwarî û guvaş li ser zimanê kurdî hene jî li gorî lêkolîneke kovara frensî (2008) ya bi navê «Le Français Dans Le Monde» li cîhanê di rêzkirina zimanên herî bibandor de zimanê kurdî di rêza 31. de cih digire. Dîsa li gorî ferhenga dijîtal ya bi navê Wîkîpediya di nava zimanên herî zêde xwedî peyv de zimanê kurdî bi 721599 peyvên di rêza nehemîn (9.) de cih digire. Ev jî nîşaneyê çandparêzî û zimanparêziya kurdan nîşan dide. Vêca kurd ji bo zimanê xwe di nava berxwedan û têkoşînek mezin de ne. Hê jî li Botanê bajarên weke Cizîr, Silopiya û Hezex dema du kes (kurd) pevte bi zimanekî biyanî diaxivin derdor bi çavek ne baş li wan dinêrin û ji wan aciz dibin. Ez ê bi gotineke diya xwe vê mijarê temam bikim. Ligel ku çend salan em li bajarê Antalyayê dijiyan ku bajarek şêniyên wî ji % 95 tirkîaxêv in jî diya min qet nexwest hînî zimanê wan bibe û hîn nebû jî. Hemû danûstandinên xwe bi kurdî dikir. Ji ber ku şerm dikir bi tirkî biaxive. Vêca dema kesek bi zimanê biyanî diaxiviya diya min digot; Hey filankes «ev çi şildî bildiya te ye» û bi vî awayî berteka xwe nîşan dida.

Weke encam bêyî ku pêdiviya mirov pê hebe yanî bêyî ku muxetabê mirov zimanacêvek zimanek biyanî be axaftina bi zimanek biyanî ya du aliyên kurd şerm e, guneh e û bêrêzî ye..

## RISTA ZIMANÊ ZIKMAKÎ

“Ziman, cewhera miletan e, bê ziman tiştekan nabe, evê muheqeq bizanin”  
(Hetawî kurd hejmar: 1)

Li ser girîngî û jêvenegeriya zimên û bi taybetî jî li ser girîngiya zimanê zikmakî gelek zimanzanan, feylesof, pedagog, derûnas, civaknas û hwd. gelek tesbît û nirxandinên giranbiha kirine û em hişyar û sergihayî kirine. Lewre ziman di dîroka mirovahiyê ya ku zêdetirî sê (3) mîlyon salan de afirîneka herî girîng , mezin û jiyânî ye. Mirovahiyê di dîroka xwe ya dûr û dirêj de gelek dahênan û şoreş pêk aniye. Weke mînak; Şoreşa Gund û Çandinyê/Neolîtîk (10.0004.000- bz) dahênana nivîsa biznarî (3.000 bz) û heta roja îroyîn ku mirov diçin ser heyv û marsê, bisedan şoreşên mezin pêk hatine, lê tu şoreşan weke şoreşa zimanî (ji zimanê nîşandanê derbasbûna zimanê hêmayî/ sîmgeyî) guhrînên bingehîn di jiyana mirov û mirovahiyê de çênekirine. Abdullah Ocalan jî di derbarê girîngiya zimên de wiha dibêje; “Belkî jî şoreşa dîrokê ya herî mezin a ku hêj nehatiye kifşkirin û navandin ev (şoreşa ziman) e. Mirov ji şoreşa mezin a yekemîn re bêje ‘Şoreşa Ziman’ dibe gengaztir be”. Wekî gelek kesayetên mîna Darwîn, Gordon Child û filologên cur be cur jî destnîşan dikin ku ziman û aqil di nava sînonîmeke hevseng de di tunela dîrokê re hatiye heta roja me. Ji ber vê çendê ziman; aqil, hiş, dîrok, çand jiyân û yekane amûra civakîbûnê ye. Di herikîna dîrokê de heta ku zimanê hêmayî bi pêş neket; aqil, civakîbûn û netewebûn jî bi pêş neketin. Yanî mirov dikare bihêsanî û bêşik û bêguman bêje; ligel peywira xwe ya pêwendiya di navbera mirovan û veguheştina çand û jiyana pêşiyên a ji bo nifşên nû de, ziman aqilê civakê ye jî.

Tenê ne ji bo civakîbûnê, herwiha ji bo netewesaziyê jî ziman xwediyê rîst û erkeke herî sereke û esasî ye. “Neteweperwerên ku di hewldana nasnameyek hevrekî (kolektîf) de ne, bi taybetî li ser yekitiya zimên radiwestin. Sedema pêşîn a vê helwestê ew e ku ziman sembola nasnameya hevpar a li seranserê welatekî rê dide ku gel xwe weke ‘em’

pênase bike ye. Axaftina bi heman zimanî dike ku gel li dorana heşt û daxwazên hevpar bigihêje hev û ji bo armancên hevpar têbikoşe“ encex mirovên bi heman zimanî diaxivin dikarin heşt, daxwaz û derûniya hev fêm bikin û li ser van têgehên jiyaneke hevpar bihonin. Ango zînamê zîkmakî ji bo neteweyan hem xerc û zemq e, hem jî xurcika ku hemû cewhera neteweyekê tê de hatiye veşartin e. Abdullah Ocalan jî zimên weke ‘beden’ê pênase dike. Gelek zimanzan û ramanyar jî zimên weke ruh û giyan pênase dikin. Ji van kesan nivîskar û lêkolînerê navdar W.Von Humboldt tevî tesbîta ku dibêje, ‘zîman ruhê neteweyan e’ dibe û wiha dibêje: “Zîmanê neteweyekê ruhê wê ye, ruhê wê jî zîmanê wê ye.

Zîman girêdayî karakterê civakê ye û wê civakê diwesifîne. Zîmanê ku xwebûna navxweyî diyar dike, tayên honandina wî zîmanî yên herî zirav û rîşikên koka wî girêdayî hêza wî ya neteweyî ye”. Li gorî van tesbîtên li jor gava mirov li zîmanê zîkmankî dinêre raşteraşt “mîrov” bi xwe tê hişê mîrov. Lewre mîrov jî ji ruh û bedenê pêk tê. Ango mîrov dikare bi hêsanî bêje zîman “mîrov e” lewre jixwe zîman tenê amûr û taybeyek xweserî mirovan e. Her wiha jî bi hevparbûn û xwepêgirtina li dora yek zanavê (nasname) netewebûnê çêdike. Di vir de tê dîtî ku çawa zîman rola tevna netewetiyê li ser xwe digire û weke şanika (hucra) kokê, raçîneka netewebûnê ta bi ta dihone. Lewre tu netewe nikarin bi çand û zîmanê biyanî li ser heman heşt û ramanan li dora heman kevneşopiyê şopên hevpar kom bibin û yekitiyek xurt pêk bînin. Bêguman mebesta me jî zimên, zîmanê zîkmakî ye. Romanûsê kurd ê binavûdeng ê gorbihûşt Mehmed Uzun li ser girîngî û wateya zîmanê zîkmakî di hevpeyvîneke xwe de wiha digot; “Zîman arşîveke giranbiha ya neteweyan e, bîr û dîroka neteweyan e.” Ma hin kes dikarin berevajiyê van gotinan tişteke îdîa bikin û li dijî derbikevin? Nîjadperest ne têde, kîjan romanûs, zimanzan, civaknas, pedagog, derûnas, psîkoanalîst û hwd. yên ku raşteraşt bi civakê re pêwendîdar in li ser girîngiya zîmanê zîkmakî ya ji bo netewetî û pêşketinê dikarin bi spartin û cerebeyên zanîstî berevajiyê

vê yekê angaş bikin. Nîn e, ji ber ku hebe wê li dijî afirandina xwezayê be. Yek ji teorîsyenên netewepereştîyê Carleton J. Hayes ku di qada xwe de navdar e, diyar dike ziman ji bo heyîna neteweyekê merca bingehîn e. Li gorî wî ziman di navbera rabirdû û dema niha de pirekê ava dike û yek riyê dide ku endamên neteweyekê bi raman û heştên xwe bigihêjin hev. Li gorî baweriya min jî têkoşîna neteweyekê ya li dijî pêkutî û bédengkirinê di xwe de qadeke zimanî û vegotinkî dihewîne û di vê qadê de ziman dibe alava berxwedana civakî. Yanî ziman çeka herî kêrhatî ya li dijî êrîşên qirkirina spî ye.

Lêkolîner Tom Naîrn jî nêrîneke nêzî ya Carleton J. Hayes tevî vê nîqaşê dibe û diyar dike ku di netewesaziyê de ziman yek ji hêmanên bingehîn e û di destê rewşenbîran de dibe alaveke têkoşînê. Heke civak zimanê xwe neparêzin, dê çanda xwe winda bikin, dê ji nasnameya xwe jî qut bibin. Ji nasnameya xwe qutbûn jî tê wateya ji dîrok û hişê xwe qutbûnê û şibîna neteweyeke din. Di vê rewşê de mirineke fizîkî tunebe jî jiyanê beletewş, rûxalî û bêwate û ne mirovî tê jiyîn. Abdullah Ocalan jî di vê derbarê de dibêje “aştî pêşketina ziman, aştî pêşketina civakê ye. Civakekê çî qasî zimanê xwe yê zikmakî bi pêş xistîbe tê wê wateyê ku ew qas aştî jiyana xwe bi pêş dixê.” Ji ber zimanê mirov ê zikmakî heqîqeta mirov e. Mirov çî qasî bi zimanê xwe bijî, mirov ew qas nêzî heqîqetê ye. Heqîqeta mirovan raştîya mirovan a neteweyî, dîrokî, çandî, zimanî, bawerî û civakî ye. Hz. Elî dibêje; ”Mirov di bin zimanê xwe de veşartîye.” Yanî zimanê te çî qas azad û pêşketî be, tu jî pêve girêdayî neteweya te jî ew qas azad û pêşketîye. Berevajiyê wê jî derbasdar e. Zimanê te çî qas vederkirî û qedexekirî be tu jî ew qas vederkirî û qedexekirî yî. Ev gotina Abdullah Ocalan ya ku dibêje; “Kesa/ê ku qeyd û lel/kelepçe li zimanê wê/wî hatibe xistin di heman demê de qeyd û lel li mejî, dil û nêrîna wê/wî jî hatiye xistin” vê raştîyê radixe ber çavan. Lewre zimanekî qedexekirî tê wateya qedexekirina çand, dîrok, erdnîgarî, bawerî, wêje û hemû heyîn û afirînekên neteweya ku bi wî zimanî diaxive.

Neteweyek ku hemû heyînên wê qedexekirî be dê bi çiawayî û bi çi/kî tiştî bigihîjin hev. Me gotibû ziman zanava (nasname) neteweyan e. Dema mirov zanava mirovekî jê bistîne ew mirov kedim (kayit dîşî) dibe. Kesa/ê kedim bibe jî tune tê hesibandin. Yanî kurt û kurmancî neteweya ku zimanê wê hatî qedexekirin û bişaftin ew netewe hatiye tunehesibandin/înkarkirin. Jixwe heke zimanê zikmakî ev qas ne girîng û jiyanî bûya, ma çima hegemonan dê ev qas ji xwe re bikirina armanc û hedefa êrîşan. Bi taybetî jî çima dewleta tirk dê zimanê kurdî yê ku dîroka wî herî kêma heta 1112- hezar sal di kûrahiya dîrokê re diçe qedexe û înkâr bikira? Ji ber ku zimanê kurdî, di heman demê de kurd û Kurdistan e; aqil, îzan û nasnameya kurdan e dewleta tirk ev qas bi çavsorî êrîşî wî dike. Ji roja dewleta tirk weke komar hatiye avakirin heta niha bisedan giştîname, zagon û bi xalên destûra bingehîn zimanê kurdî qedexe û înkâr kiriye û polîtîkayên biçûkxistin, bişaftin û reşkirinê li ser dane pêkanîn.

Ji dema destûra bingehîn a sala 1924'an hatiye derxistin heta niha Plana Islekkirina Şerqê (Şark Islahat Planî -1925), ji 'Zagoan Tunçeli' (Tuncelî Kanunu) bigire heta bighêje cuntaya 12'ê Îlonê û heta bigihêje serdema hikûmetên serdema AKP'ê tim û tim zimanê kurdî eşkere an jî veşartî di hedefa êrîşên nîjadperstî de ye. Weke mînak Cuntaya 12'ê îlonê di sala 1982'yan de bi zagona hejmar 2932'yan destnîşan kir ku "zimanê her kesî/ê yê zikmakî tirkî ye" û bi vê zagonê hêj mirov di zikê diya xwe de ne û nehatine ser rûyê dinê zimanê wan ê zikmakî hat qedexekirin û tunehesibandin. Heta xwe kirin şûna Xwedayê xwe û biryar dan ka zimanên hemwelatîyên cihê yê zikmakî dê çi bin. Sedema vê zagonê ya sereke û bingehîn parçekirin û bişaftina neteweya kurd bû. Kampanyayên "Türkçe konuş, çok konuş" (Tirkî biaxive pir biaxive) û bidehan rê û rêbazên bişaftina zimanê kurdî (û yên neteweyên din) xistin meryetê. Herî dawî di serdema hikûmetên AKP'ê de bi taybetî jî polîtîka û perspektîvên serokwezîrê wê serdemê Recep Tayyip Erdogan kampanyayên "Keçino de berê xwe bidin dibistanê" (Haydî kızlar okula) ên ku di malpera

kampanyayê de dihatin weşandin têra xwe ravekar in. Di malpera wan de wiha digot; Perwerdehiya kurekî tenê wî eleqeder dike, perwerdehiya keçekê malbatê jî eleqeder dike.

Dema zarok mezin dibe, perwerdehiyê ji diya xwe werdigire; perwerdehiya jinan di demên pêş de ji bo perwerdehiya ku wê bidin zarokên xwe girîng e”. Di vir de rasteraşt armanc ji perwerdehiyê wêdetir bişaftina keç-jin-dayîkên kurd bû. Ev nêzîkatî heta îro jî dom dike. Lewre ji bo bişaftinê di nava bajarên kurdan de kategoriyên weke herêma 1. 2. û 3. Destnîşan kiribûn/kirine. Di nava vê kategorîkirinê de Şirnex, Colemêrg, Sêrt, Êlih, Agirî, Bedlîs, Mûş, Wan, Amed û Riha di koma yekemîn ya ku divê ev kampanya lê bê destpêkirin û herî zêde li ser bê rawestandîna û bê şopandîna de bûn. Koma asta duyemîn û sêyemîn jî dîsa bajarên kurdan bûn. Yanî mebest armanc ne xwendekirina keşan bû, mebest û armanc tirk-kirina kurd û Kurdistanê bû û ev hewl hê jî bênavber didomin. Heta bi awayek plansazkirî û pînî (sinsi) tê kirin. Di sedsala 21’emîn de hê jî qebûlnekirina perwerdehiya zimanê zikmakî (kurdî) û qedexa û astengiyên li ser kurdî tînin meşandin polîtîkayên dewleta tirk ên bizanebûn, stratejîk û bîrdozî ne.

Weke encam, zimanê dayîkê ango zimanê zikmakî ji bo nîjad û neteweyan ji amûra ragihand û danûstandînan wêdetir sedema hebûn û nebûn û man û nemanê ye. Nexwe heke ziman ruh û giyan be dema ew ziman bi awayekî ji holê rabû xwediyê wî zimanî jî dimire. Ji ber ku zimanê dayîkê komasî û gencîneya hemû dahênan, kevneşopî, çand, sinc, dîrok û kelepora neteweyan e. Ji holê rakirina zimanê dayîkê sifîrkirina hiş û bîra wî neteweyê ku wî zimanî diaxive ye.

Mixabin em weke gelê kurd, bi siyasetmedar, nivîskar, hunermend, rêveberên sazî û dezgehên kurdan, bi xebatkar û şoreşgerên xwe ve li şûna ku em li hember van êrîş û polîtîkayên asîmilasyonîst û nîjadperest bibin xwedî helwest û zimanê xwe (kurdî) di her qada jiyanê de bikar bînin û bipêş bixin, em ji xwe û ji xetere û polîtîkayên li ser zimanê xwe

bêhay û di xefletê de ne. Herwiha em xwe, malbata xwe, derdora xwe û bi giştî gelê xwe diavêjin ber aşê bişaftinê. Hema bêje em piraniya kar û jiyana xwe bi zimanê serdestan dimeşînin. Bi mîlyonan kurd îro di nava rewşa xwebiştandinê de ne. Yanî di nav me de çerxa xwebiştandinê (otoasîmîlasyon) bi şidek lez dizivire û me ji kurdbûnê derdixe. Sedemê vê rewşa kambax û malwêran belko ji sedê 90'ê em bi xwe ne. Em karê dewleta asîmîlasyonîst hêsan dikin. Em tenê di gotinê de zimanê xwe (kurdî) nirxdar dibînin; di pratîk û pêkanînê de em tu nirxî nadin zimanê xwe. Ji bo azadkirina vî zimanê gelek bedelên mezin hatine dayîn û hê jî tê dayîn. Îro nêzî deh hezar siyasetmedar pêşengên kurd wê di zindanan de ne. Herwiha yek ji daxwazên gelê me ya sereke serbestberdana zimanê zikmakî ye. Lê dîsa sed mixabin ew kesên ku îro di zindanan de ne jî piraniya wan bi zimanê tirkî xwendin, nivîsandin û axaftinên xwe dikin. Ev cihê şermê ye û rexneyek hişk û tund jî heq dike. Divê em weke gelê kurd, siyasetmedar û rewşenbîrên kurd vê xetere û bişaftinê ji ser zimanê xwe û vê şerm û rûreşiyê jî ji ser xwe biavêjin/rakin. Gelo divê ji bo azadkirin û zindîkirina zimanê kurdî em çî bikin?

Divê em bizanin ku xwedîlêderketina zimanê zikmakî, xwedîlêderketina pêşeroja me ye. Civak û neteweya ku bi çand û zimanê xwe neji, li sedemên hebûna xwe xwedî dernekeve (ku çand û zimanê neteweyekê yekane mîsogerîya hebûna wê ye) ne gengaz e ku ew civak/netewe azad û serbixwe bijî. Ango divê her keç û law, her jin û mêr, her biçûk û mezin, her dê û bav û her rêveber û xebatkarê/a kurd ji xwe û hebûna xwe hez bike. Jixwehezkirin tê wateya ji erdnîgarî, dîrok, çand, ziman, kevneşopî û ji welatê xwe hezkirinê. Ango ji hemû heyîn, heyber û nirxên ku neteweyan dike netewe hezkirin e. Lewre hemû hêlên mirov ên dardingî (madî) û manewî (nîjad, netewe, welat, bawerî, sinc, dîrok, çand, ziman, bîr û her wekî din) heqîqeta mirov e.

Divê li şûna ku em bi çavên neyar û xêrnexwzan li çand û zimanê xwebinêrin û zimanê xwe biçûk, bêkêr, bêrûmet, li paşmayî û bêbandor



bibînin, divê em berevajiyê wê bi çavê heqîqeta xwe ya ku zimanê kurdî di serdema Gund û Çandiniyê/Neolîtîkê (10.0004.000- bz) de ji hêla dapîr û bapîrên me (kurdan) ve hatiye xuliqandin û nifş bi nifş heta roja îro veguheştine me û ji me re mîrasek/mîrateyek bêhempa ye lê binêrin. Li hember zimanê me yê zikmakî (kurdî) tekane û yekane erka me ew e ku em di tevaahiya jiyana xwe de wî bikar bînin. Êdî dema hilweşandina qereqolên ku dagirkeran di ser û mejiyê me de ava kiribûn/ava kirine hatiye û derbas jî dibe. “Keleh û çepera her neteweyekê zimanê wê yê zikmakî ye. Dema ku ew keleh û çeper hatin herifandin heyîna wê neteweyê jî tê herifandin.” Yanî her peyva bi zimanê biyanî tê axaftin, her berhema bi zimanê biyanî tê nivîsandin, her materyala bi zimanê biyanî tê xwendin, her çîrok, mamik, stran û qerf û henekên bi zimanê biyanî tên vegotin û guhdarkirin mirov gavekê dûrî çand û zimanê mirov dike. Em nabêjin bila qet bi zimanê biyanî neyê axaftin û xebat pê neyê kirin, lê ji berî ku em zimanê biyanî bikar bînin divê em zimanê xwe yê zikmakî baş bizanin û ji xetereya bişaftin û windabûnê rizgar bikin.

Jixwe heta mirov zimanê xwe yê zikmakî baş nizane ne genaz e ku mirov bikare zimanekî din bêpirsgirêk û bêastengî bikar bîne. Bi taybetî jî pedagog û pisporên geşebûyîna/pêşveçûna zarokan li ser girîngiya zimanê zikmakî radiwestin û şîreta ‘bila her zarok bi zimanê zikmakî perwerdehiyê bibînin’ li rayagiştî ya cîhanê û li dê-bavan dikin. Biserketina zarokan di zimanê wan ê zikmakî de veşartiyê. Dema perwerdehî bi zimanê zikmakî be mirov (zarok) bi wêrekî hemû behre, afirînerî, jîritî û kargîniya xwe derdixe holê. Yanî xwe û dilînên xwe bêkêmasî tîne zimên. Lewre gotina pêşiyên ya dibêje; “Her giha li ser koka xwe şîn dibe” ne beyhûde hatiye gotin. Xwendin, nivîsandin, guhdarkirin û axaftina berdewamî ya bi zimanê biyanî weke ku mirov darfêkiyekê fitrûm (aşî) bike, êdî ew darfêkî fêkiyê cureyê lê hatiye fitrûmkirin dide, mirov jî wisa tê fitrûmkirin û bi zimanekî din re dijî. Ji eslê xwe (ji zimanê xwe yê zikmakî) dûr dikeve û dibe biyaniyê xwe û neteweya xwe.



Dema mirov li rewşa kurdan dinêre, mirov gelek pê diêşe. Îro di cîhanê de zêdetirî 40 mîlyon gelheya (serjimar) kurdan heye û piraniya wan li çar dewletên ku Kurdiştan di nava xwe de parve kirine de dijîn, lê hê jî zimanê kurdî nebûye zimanê perweerdehiyê û ji bin xetereya windabûnê rizgar nebûye. Ji nêzîkatiya dewletên serwer wêdetir hin (piranî) kurdên di sazî û dezgehên kurdan de dixebitin jî bi awayek reşbîn û neyînî li zimanê kurdî dinêrin. Bi taybetî jî kurdên polîtîk û siyasetmedar bi zimanê biyanî (tirkî, erebî, farisî) siyasetê dikin. Wêjekar û nivîskarên kurd dema xwe, keda xwe, zêhna xwe û bîr û mejiyê xwe didin tirkî û berhemên xwe bi zimanê tirkî dinivîsin. Bi taybetî jî kesên xwe weke welatparêz dihesibînin hema hema kar û jiyana xwe ya rojane hemûyê bi zimanê tirkî dikin. Yê ku kar û jiyana wan bi kurdî jî hene, bila mafê wan neyê xwarin, lê piraniya me “Kewgirê xelkê ne , civîkgirê xwe ne”. Di vir de du îxtîmal derdikevin holê, yan bi xwe û kesîtiya xwe ne ewle ne, yan jî em bi qedirbilindiya zimanê xwe ne ewle ne. Her du rewş jî ji bo me cihê şermê ne, sedema xetereyên mezin in. Li vir pêwîstî pê heye ku mirov mînaka zimanê îbranî (îsraîliyan-cihûyan) bide, ka zimanek dikare çawa bê paraştin û pêşvebirin.

Dema ku tu organîzasyonên siyasî (dewlet) yê cihûyan tunebûn zimanê wan di quncikên tarî de, tenê di pirtûka pîroz Tewratê de mabû. Yanî zimanê îbranî qediyabû û êdî tu kes pê nedipeyiviyan, mirovekî îbranî-cihû yê bi navê Elyezer Ben Yehûda bi tena serê xwe dema ku li Rûsyayê bû biryar girt ku zimanê xwe (îbranî) berhev û zindî bike. Vî mirovî nêzî 40 salan karê xwe yê sereke û yekane kir berhevkirin û zindîkirina zimanê îbranî. Bi axaftina nava malbata xwe dest pê kir û hêdî hêdî hevalbend ji xwe re peyda kir. Bi derxistina rojnameyê, peyre weke mamostetiya kursa zimanê îbranî, vekirina dibistaneke taybet a bi îbranî û piştî jî zanîngeha bi zimanê îbranî bi ked û hewldanên mezin zimanê îbranî nû kir û pêş xist. Di dawîya dawî de jî ferhengê ji 20 hezar peyvên îbranî pêk tê ya ku di encama xebatên 40 salan de çap kir/weşand. Elyezer Ben

Yehûda bi yekitiya zimanî yanî bi geşkirina ziman bû sedem ku cihû bi netewetîya xwe bihesin û li Filîstînê kom bibin.

Dewlet û netewetîya îsraîliyan li ser xîmê ku Elyezer Ben Yehûda danî yê ku bi zimanê îbranî saz kiriye hat avakrin. Vêca çima em kurd li ser xaka xwe û derfetên gelek mezintir û pirtir di destê me de hene û em nikaribin tenê zimanê xwe ji xetereya windabûnê rizgar bikin û bikin zimanê jiyane. Me li jor jî gotibû ku rewş û statûyaz imane neteweyekê di heman demê de rewş û statûya wê neteweyê ya azadî û pêşveçûnê ye. Lewre divê em her qadên jiyane/kurd lê hene (bi taybetî jî zindanan, malan, kargehan, kolanan, sûkan, çiyane û hemû sazî dezgehên xwe) bikin dibistanên kurdî û em bi xwe jî hem bibin xwendekar û şagirt, hem jî seyda û mamoste, hem hîn bibin, hem jî hîn bikin. Erê, di vê em îro dest pê bikin, ne sibe, divê em niha dest pê bikin, ne gavek/bêhnek din. Divê di serî de em ji xwe dest pê bikin ne ji kesek din. Gelo bê ziman jiyane dibe...? Tu/hûn çi dibêjin?bi ya min

“BÊ ZIMAN JIYAN NABE”!